

**Rengûawayê Hegamonîk yê Wêjeya Dinyayê û Wekî Wêjeyeke Di Bin Zordarîyê De;
Şûnewara Wêjeya Kurdî**

dr. Dilawer Zeraq

*Bedewîtî ne di pawana tu nîjadî de ye
Jirîtî û hêz, her kes, roj tê
Digihîje serkeftinê¹*

Césaire Aim

Wêje û berhemên wêjeyî, di kakila xwe û di demajoya afirandinê de, bi giştî û wekî çalakgerî, berhênana kesane ye. Her çend ev yek di demajoya afirandinê de, wekî rola ku nivîskar bi xwe pê radibe wisa xuya bike jî, hin kartêk hene ku nivîskarên wêjeyê çî jî bikin û çawa jî bikin nikarin xwe jê bêrî bikin û ew hêman û kartêk, çî bi hemd çî jî bêhemd, bi awayekî ji awayan xwe di nav nivîsê re dikin û bi roleke wisa xwejevêdizîyayî radibin ku nivîskar bi xwe jî, piştî biseravêketina wan, nikare xwe jê bişo.

Ger em bipirsin û bêjin; gelo çî ne ew hêman û kartêk? Em ê karibin wekî bersiveke berbelav bêjin; ziman, çand û nêrîtên dinyayî û jîyanî yên neteweya nivîskar in ku nivîskar bêyî vîn û hemdê xwe tê de cî daye xwe û wan hêmanan kartêk lê kirine û bi awa û naveroka wan hêmanan rengêkî kakilî û naverokî bo nivîskar çêbûye.

Nexwe pirsên dîtir jî hene em bikin; gelo têgiha Wêjeya Dinyayê di kîjan şûnewarê (space, uzam) de cî dide xwe, behsa kîjan ziman, çand û nerîtê dike ku bûye dinyewî û Wêjeya Dinyayê jî kîjan ji van hêmanan pêk hatiye? Gelo ji biyekbûn û hevgihana hemû ziman û çandên dinyayê pêk hatiye? Gelo rengê kakila Wêjeya Dinyayê çî ye?

Pirsên bi vî rengî di heman demê de rêyên bersivandin û aşkerekirinê ne jî. Ji ber hindê, têgiha Wêjeya Dinyayê, ji serî de, konseptêke tevdehîyê di hişê me de çêdike û heke em li ser hişê xwe yê heyî nemînin, dibe ku em ji ber bisemyaniya têgihê ji ser xwe ve jî biçin.

Ji hêla din ve, Pascale Casanova datîne rastê û bi me dide nîşan ku wêje û zimanên “marjînalîtir” dûçarî zordestîya ziman û wêjeyên di ‘navendê’ de dibin û wekî dongîya vê deravê jî pergaleke ‘newekhevî’yê ava dibe. Em ê jî, vê pergala ku li ser ‘newekhevîya ziman û wêjeya neteweyên neserwer û bindest’ serwerîya xwe dimeşîne, li xwe bikin sedema hûrgerîya xwe ya sereke û di ser têgihên, ‘cîhêtiya çand û zimanan’ û ‘neteweyîbûna wêjeyê’

¹ Césaire Aim, 2003: 277

re bal û nêrîna xwe li ser wêjeya neteweyên ‘netewebûna wan nehatî naskirin’ û ‘bêdewlet in’ hûr bikin û tê de bixebitin da ku karibin tê bigihîjin ka bera jî pêwîst e ku ‘neteweyên biçûk’ û ‘wêjeyên neteweyên nehatî naskirin’ ji alî ‘komara wêjeya dinyayê’ ve bê nasîn an jî gelo ji bo ku ‘neteweyên biçûk’ di biwara wêjeyê de nekevin ber pirs û arîşeya ‘hebûnê’ pêwîst e rê û rêbazên bi çî rengî pêk bînin û ji bo neqandin û bicîanîne çî rê û rêbaz hene li pêş wan.

Sazbûna Têgiha Wêjeya Dinyayê

Wekî famkirina ji têgihê û wekî rengpêdana naveroka wê, dem xweşikî ne dîyar be jî, Fumaroli bala me dibe serê û dibêje, “Wêjeya Dinyayê, di serdema Ronensansê de, cara pêşî li Venedîka Îtalyayê (bi têgiha *Respublica litteraria* ku Francesco Barbaro cara pêşî bi kar anîye-1417) hat bilêvkirin û piştî mirina Pinelli, dem pê de, berê xwe da bi bakurê Ewropayê ve”² (Fumaroli Marc, 2004: 35) Fumaroli li ser zêde dike û dibêje, Ewropa hingê di nav pêşbazî û hevrikîyeke guherîne de bû û “Ji destpêka sedsala XVan û şûnde, li dijî pêşdarazîya Parîsê, hin deng ji Îngilistan, Spanya û Elmanyayê derketin. Di vê pêşbazîya Ewropayê de, bi dahênana xwe ya Komara Wêjeyê ve Îtalya bû sergovend: Lê belê, piştî şerên sedsalan, Fransayê ev dahênan jê wergirt û bi vî awayî şanazîya xwe ya berê bi awayekî din meşrû kir.”² Bi vê agahîya Fumaroli dayî, em serê pêşîn pê dizanin; têgiha Wêjeya Dinyayê ji alî şûnewarê ve ne cîgirtî û dîyar e ji ber ku hê ji serî de bi hin qewaman, yê wekî şerên sedsalan, bûye alava desthilatan.

Pascale Casanova ku bi awayekî kûrayî û berfireh li ser vê dabaşê sekinîye, wekî sazûn (a rast wekî ‘çêkirin’ a) têgiha Wêjeya Dinyayê, dibêje: “Em dikarin bêjin, Şûnewara Wêjeya Dinyayê, di sê qonaxan de çêbûye û bi pêş ve çûye. **Ya pêşî**; rastî derketina rastê ya Pléiade yê Fransî û leqayî çapkirina *La Deffence et Illustration de la langue françoise* ya Du Bellay tê.³ **Ya di pey re**; her wekî ku B. Anderson jî pênase dike, leqayî ‘şoreşa ferhengê’ (an jî ‘şoreşa filolojîk’) tê.⁴ **Ya dawî**; bi demajoya rûxîna pergala mêtîngerîyê dest pê kiriye û aktorên nû tev li derdora hevrikîya navneteweyî bûne ku heta wê hingê bi ramana wêjeyê re nehatine behskirin.” (Casanova Pascale, 2010: 61-62)

² Tevî ku “Avakarê Wêjeya Dinyayê, Petrarçayê Îtalyan e” jî, (Fumaroli Marc (2004), Edebiyat Cumhuriyeti, Dost Kitabevi Yayınları, Ankara, 1. Basım, r.p: 35) Îtalyanan nekarîne li ser wê bîmînin, xweyî li vê şûnewara ku îro ro di warê ziman û wêjeyê de serwerîya xwe li dinyayê dimeşîne, bikin û ew berdane bi destê Fransî, Îngilîz û Elmanan.

³ **Benedit Anderson ev qonax bi “şoreşa zimanê gel” re dike yek.**

⁴ **Vê qonaxê di dawîya sedsala 18an de dest pê kiriye û di sedsala 19an de kudandiye û di vê qonaxê de ramanên “neteweparêz” ava bûne.**

Di agahîyên Casanova dayî de, alîyê herî balkêş û berbiçav ev e: Fransî, wek çalakgerî û pêkanînên ku dibin naverokên têgiha Wêjeya Dinyayê, piştî ku bi dest xwe ve tine, têgiha Wêjeya Dinyayê ji dest xwe bernade, berevajîya wê, bi hin xebatên xwendewarî û ziman û çanda neteweyî yên wekî çapkirina pirtûk û ferhengên şoreşê, têgiha ketî behsê li ba xwe qewîntir dike û dawîya mayîn jî, di qonaxeke ecêb û taybet de, qonaxeke ku naverok û mebesta vê nivîsê pir zêde eleqedar dike; bi qewlê Casanova ve di ‘qonaxa rûxîna mêtîngerîyê’ de têgiha Wêjeya Dinyayê berbiçavtir dike.

Nexwe girîng e em wekî çalakî û pratîk, li ser agahîya ku Casanova dide, bimînin ku ew dibêje; “Şûnewara yekem û destpêkî ya Wêjeya Dinyayê, Fransa û wek çand û ziman jî zimanê Fransî û wek şûngeh (mekan) jî Parîs e. (...) Fransîyan, piştî sala 1530yê li dijî serwerîya (hegemonya) zimanî û dînî ya Latînî bizaveke giştî ya zimanî dan der û tevgereke ‘laîkbûnê’ dan destpêkirin û ji bo ku zengînîya şêwaz, wêje û helbestê were “xurtkirin”, Fransî wekî zimanekî esasî, li her alîyê Fransayê hat qebûlkirin.” (Casanova Pascale, 2010: 64-65) Pê re jî, li ser pêşniyaz û pêdagirîya hişk û cîgirtî ya Du Bellay, “ji bo zengînkirina Fransî, werger hatin kirin û peyv ji zimanên bîyan hatin deynkirin.” (Casanova Pascale, 2010: 65) Digel vê jî, ji bo lêanîna çanda nivîskî ya Latînî û zengîntirkirina zimanê Fransî û wêjeya Fransî, Du Bellay, “...metafora ‘daqurtandin’ê bi kar dianî” û digot; “Divê em nivîskarên herî baş yên Yewnanan texlît bikin, divê em bibin ew, divê em ziman û wêjeya wan *daqurtînin* û piştî ku me ew xweşikî û têra xwe mehandin, hemû dane û hêmanên me ji wan girtî *li xwe bikin* xwîn û zad û adan...” (Casanova Pascale, 2010: 68) Em bi van agahîyan têdigihîjin ku Fransîyan bi awayekî gelemperî û bi rê û rêbaza xwemalîkirinê, wêjeya bi zimanê Fransî, li ser çanda nivîskî ya Latînî xurttir û zengîntir kirine û bi vî rengî berfirehî û kûrahîyeke taybet bo nivîskarî û wêjeya bi Fransî çêkirine. Û li ser fikra Casanova, ji ber ku li wir hilberînên wêjeyî bi awayekî ji çarçove û deqbanda (konteksta) polîtîk bêrî û azad diafire, cara pêşî xweserîya wêjeyî li Fransayê aj daye û loma jî Parîs, wekî şûnewar û navenda yekem ya Wêjeya Dinyayê modêleke sereke ye ji bo hemû neteweyan. (Casanova Pascale, 2010: 83)

Lê belê, hevrikeke hêjayî balpêdan û xwelêdanîne ya vê modêlê hebû ku hem di warê zimanî hem di warê hêza şerkinê hem jî di warê pêşveçûnên sîyasî û aborîyê de, wisa bi xurtî û reqîya xwe ve, li ber Fransayê disekinî. Ew hevrik, Îngilistan bû.

Îngilistanê ji sedsala 16an û pê de û bi taybetî di dawîya sedsala 18an de, di warê mêtîngerîyê de gelek xurt bûbû û bi awayekî berbelav û ji alî aborî û serdestîya cografîk ve hikm li dinyaya heyî dikir. Ji alî wêjeyî û zimanî ve jî, li dijî Fransîyan, Îngilîzan hem bûbûn hevrikeke Ewropayî hem jî ya dinyayî. “Îngilîz wê gava ku ji alî sîyasî û aborîyê ve xurttir dibûn, ji hêlekê ve jî rêzikên zimanê Îngilîzî datanîn û pisporên ziman, ferhengszaz û

wêjekaran rengûawayê dawî ya modern didan zimanê Îngilîzî.” (Casanova Pascale, 2010: 88) Edebiyata Îngilîzî, digel serwerîya aborî û bi piştgirîya wê, wekî yek ji sedema hevrikîyê, ‘bi protestanîya xwe ve li dijî Fransaya katolîk disekinî’ û bi vî awayî jî, “Dîn; hem ji alî awayê bîrûbawerîyê ve dibû yek ji sedema hevrikîya hişk û xurt.” (Casanova Pascale, 2010: 88) Digel vê yekê jî, mêtîngerî û pêkanînên wê yên asîmîlekar û ji hemûyan pêşvetir û girîngtir, hêza sîyasî û aborî ya Îngilistanê jî, yek ji sedema herî berbiçav û kartêker e ku ji alî zimanî ve bandorê li dinyaya heyî û li Ewropayê bike. Her wiha, wekî dongîya vê deravê û wekî ku Stefan Collini destnîşan dike û dibêje, “Li Îngilîzan bûbû banekî ku di wêjeya xwe de reng û derbirana herî tîpîk û deqane ya karaktera neteweyî bibînin.” (Yê Radiguhêzîne: Casanova Pascale, 2010: 89) Vê taybetîya neteweyî ya Îngilîzan kiribû ku ew bi wêjeya xwe ya neteweyî, di wê keftelîfta jîyana pirhêlî û têr gelemşe de bêxweyî nehêlin, pêşî li hêmanên neçê bigirin û li ber xwe bidin da ku wêjeya wan di ser pergala wêjeya li Parîsê re neyê yekrengkirin û neyê windakirin. Vê dijatî û berhilistîya wan ya li ser Îngilîzbûnê avabûyî kir ku “Ziman û wêjeya Îngilîzî, li dijî û li pêşberî ziman û wêjeya Fransî, bibin hêza yekem yên zimanî û wêjeyî.” (Casanova Pascale, 2010: 89-90)

Û Elmanya. Gava Fransîyan di sala 1530yî de, li dijî serwerîya Latînî bizaveke serwerkirina zimanê Fransî û laîkbûnê dane destpêkirin, di sala 1534an de jî Martin Luther Încîl wergerandiye Elmanî. Wî, bi vê wergerandîna xwe ve, ne tenê hikmê Latînî ya li ser Elmanî şikandiye, di heman demê de jî, hîma şeweyekî hevpar yê nivîsînê ji bo Elmanî danîye û ev yek di siberojê de bûye hîma Elmanîya modern.

Ji bilî vê yekê û ji gelek tişt û hêmanan girîngtir, di salên dawî ên sedsala 18an de, Elmanan şoreşgerekî zimanî, çandî û neteweyî yê bi navê Herder hebûye. Şoreşgerîya Herder, serê pêşîn li dijî Friedrichê II. daye der ku Friedrich hewl daye “şûndemayîna Elmanî” ji navê bibe. Di heman demê de jî, wî wergerên ku heta wê hingê ji Fransî bo Elmanî hatine kirin, ji bo “Ziman û Wêjeya Fransî wekî mînak girtiye û bi awayekî sergirtî serwerîya wan qebûl kiriye.” (Casanova, 2010: 89) Wekî din jî, Herder bi hişkayî li dijî pênaseya gerdûnî û dinyayîbûnê, ya ku Fransîyan kiriye, rabûye⁵ û ji wê hingê ve, danîye rastê ku di navbera ziman û neteweyê de pêwendîyeke bivênevê û jênager heye û bi gotina xwe ya pirsyarkirinê, “Gelo ji bo neteweyekê, tişteki ji zimên hêjatir û giranbihatir heye ku ji bavûkalê wê maye jê

⁵ Dinyayîbûna zimanî ku Fransîyan jê fam dikir û pênase dikir wiha ye: “Li dinyaya ku bi hevirkîyên sîyasî li hev dabeş bûye. Pêwîst e yekbûnî careke din jî were avakirin. Ji bo vê yekê jî divê dev ji lişteken (menfîetên) kesaneyî û neteweyî bê berdan û dinya li dora zimanê Fransî li hev bihêwire. Ev êdî ne zimanê Fransîyan e, zimanê mirovahîyê ye.” (Casanova, 2010: 86)

re? Di nava zimên de, hemû nerît û kelepûr, dîrok, ol û rêgezên hebûnê dijîn; ziman dil û gîyan e” (Raguhastin: Özkırmılı, 1999: 15) jihevcihêbûna neteweyan aşkere kiriye û dîsa, wekî şoreşeke ramanî ya li ser ziman û çand û wêjeyê, “ji bo neteweyên ku hê ji alî neteweyên dîtir ve nehatine nasîn û nehatine qebûlkin jî doza heqê hebûnê yê di helûmercên wekhev de kiriye.” (Casanova, 2010: 90) Ev yek hem ji wê hingê ve hem jî di roja îroyîn de, helwest û sekneke şoreşgerane ye ku ne tenê heqê neteweya xwe diparêze, di heman demê de, li dijî desthilat û serwerîya yekalî ya dîyarkirina Şûnewara Komara Wêjeya Dinyayê ye ku heqê neteweyên dîtir jî diparêze. Herder, ji ber vê helwest û ramanên xwe, wekî “‘Ezbenîyê nîjada Xirwatan’ û ‘Kesê yekem ku pesnê Slavan dide û heqê wan diparêze’” tê binavkirin. (Casanova, 2010: 92)

Elmanya, heta dawîya sedsala 18an, ji alî neteweyî û sîyasî ve negihîştiye hev û nekarîye di hevrikîya Fransa û Îngilistanê ya ji bo desthilat û serwerîya Wêjeya Dinyayê de xweşikî cî bide xwe. Lê belê piştî ramanên Herder û guherînên rewşa sîyasî ku bûye sedema yekbûna neteweya Elman, pêşniyaza Herder ya vegera li ziman û wêjeya gel û şertê wî yê ku danîye û gotiye, “Divê berhemên wêjeyî an ‘neteweyî’ an jî ‘populer’ bin” (Casanova, 2010: 120) bûne sedem ku hişyarîyeke neteweyî ya Elmanan çêbibe û xwedîtî li ‘mîrateya xwe ya neteweyî’ bikin. Nûtîya ku Elmanan di ziman û wêjeya xwe de kirine û pê xwe gihîştandine asta wêjeyî û xwendewarîya Fransî û Îngilîzan û ziman û wêjeya Elmanî, wekî şûnewara sêyem ya Wêjeya Dinyayê, bi cî kirine.

Zimanê Neteweyî û Neteweyîbûna Wêjeyê

Ziman, ji bo her kesê ku endamê komên etnîk û gelan e, dayînî ye û dayînîbûna zimên, di heman demê de dike ku ziman ji bo kes û gelan nebe diyardeyeke afirandî an jî dahênandî (îcatkirî). Loma jî, berî ku ramana netewe û netewebûnê peyde bibe, çî biçûk çî mezin, çî desthilat çî ne-desthilat, çî serdest çî bîndest, hemû endamên gelên ji hev cuda, wekî bavik, komên etnîk an jî gelên mezin, xweyî zimanekî hevpar in û bêyî ku zimanê wan bi awayekî navxweyî an jî derveyî bibe sedema dijminî, lihevnekirin û pevçûnê, ew komên xelkê di nava xwe de, bi awayekî kesaneyî ‘wekî xwe ne’ û bi awayekî komelî jî ‘wekî hev in’ û bi awayekî sirûştî bi zimanê xwe diaxivin û zimên wekî navgîna jihevfamkirinê bi kar tînin.

Digel wê jî, “Ziman ew hokar e ku di jîyana me a civakî, di famkirina me a dinyayê de cîyekî xwe î girîng heye.” (Zeraq, 2018: 29) Hokarîya zimên ku wekî şûngeha (mekanê) bandorlêkirinê hiş û mêjî li xwe dike war, dike ku ziman di biwara giştî, di biwara komên xelkê yên mezin an jî bi gotineke din, di biwara neteweyê de, bibe navgîneke girîng û kartêker. Loma jî, di bizav û tevgerên neteweparêzîyê, yên ku di dawîya sedsala 18an û

destpêka sedsala 19an bi şûn de geşe bi xwe dane, ziman ew hêman e ku herî zêde li ser hatiye sekinandin û bal bi wê hatiye dayîn û ziman bûye dîyarkerê gelek derav û taybetîyan. Bi taybetî jî li Ewropayê, di qonaxa avakirina netewe-dewletan de, ziman bûye palder û argumaneke hîmî.

Herder, bi dîtîna û ramanên xwe ên li ser ziman û li ser pêwendîya zimên ya bi avabûn û hebûna neteweyan re heyî, bûye pêşengekî kartêker di avabûna neteweya Elmanan de. Wî, li ser ziman û li ser civak û neteweyê, bi gotina xwe ya, “Tiştê ku mirov dike mirov, ziman e. Mirovbûn ew wate ye ku zimanekî te heye û tu di nav civakekê de dijî.” (Yê radiguhêzîne: Özkırmılı, 1999: 34) qonaxa avabûna neteweya Elman û yêneteweyên dîtir xurttir kiriye. Ev xurtbûn ne tenê di warê ramanî de ye; helbet, hûrgilîya di vê gotinê de ku dibêje, “tiştê ku mirov dike mirov, ziman e” hestên bixwebawerî û bixweşanazîyê bi mirovan re çêdike. Ev hestên hanê, piştî ku di dil û hişê mirovan de bi xurtayî û qewînî cî dide xwe, mirov, wekî kes, dikarin li ser xwe û li ser pêwendîya xwe ya bi neteweyên din re bifikirin; û bi taybetî di warê çandî û zimanî de, hem hay ji ‘cudabûna xwe ya ji neteweyên din’ bibin û hem jî hay ji ‘wekîhevîbûna endamên neteweya xwe’ bibin. ‘Jihevîcudabûn’ û ‘Wekîhevîbûn’ a ku mirov hay jê dibin, ji ber rengûawayê zimanan e û endamên her zimanekî ji hev cuda, bi rewş û veberîna taybetîyên zimanê xwe, hem li gorî zimanê xwe hem jî li gorî zimanên dîtir, dibin xweyî karaktereke hîsî û ramanî. Loma ye Humboldt balê dibe ser rengûawayê vê karaktera hanê û dibêje, “Karaktereke zimanan heye, her wiha cudatîya neteweyê jî, bi rêya gerdîş û nerît û kirin û banekî û pêkanînan nayê zanîn, lê belê bi rêya zimên tê zanîn. (...) Ziman xuyanga derveyîna a neteweyan e. Zimanê neteweyan gîyanê wan e, gîyanê wan jî zimanê wan e” (Ya radiguhêzîne: Akarsu, 1995: 52) Di vê qonaxê de, mirovên ku ev hayjêbûna hanê li wan diqewime, êdî bêtir bi rengê karaktera zimanê xwe dihîsin, wê karakterê xweşiktir nas dikin û ev naskirin dike ku endamên neteweyekê bi kartêka zimên rabin û xurttir tev li qonaxa avabûna neteweya xwe bibin.

Herçî behs wêje ye; ziman, wekî hêmaneke bivênevê, ji bo wê hem alav e hem jî armanc e. Ji hêlekê ve, ji bo ku wêje çêbibe, ziman wekî hêmaneke bivênevê li rastê ye û di vê qonaxê de; ziman ji bo pêkhatin û çêbûna wêjeyê dibe alavek. Ji hêla din ve jî, ji ber ku yek ji armanca wêjeyê, wek wêje, geşebixwedan e û ew çarneçar e vê yekê dîsa bi zimên, -bi zimanekî xemilandî, petî, sade, lihevgerandî, mecazî, metaforîk an jî tê de ciwankarî hatiye kirin...- bike, ziman ji bo wêjeyê hem dibe alav hem dibe armanc. Û hemin ku her komên etnîkî û her neteweyên avabûyî xweyî zimanekî xwe yê arizî xwe ye, wêjeya bi zimanê wan jî, dibe ew wêje ku bi taybetî, naverok, kakilên çandê, rabûnûrûniştin û kelepûra bi wî zimanî hatiye rengînkirin û nîgarkirin.

Loma jî, em bi vê rastîniyê, dikarin bêjin; ziman wekî yek ji nîşane û sembola girîng ya ji bo hebûn(îy) a neteweyekê, hêmana bivênevê ya wêjeya wê neteweyê ye û wêjeya neteweyekê bi xurtî bi zimanê neteweyî ve girêdayî ye. Li ser vê rastîniyê jî, bizavên neteweyîkirina wêjeyê, hema bêje di hemû wêjeyên dinyayê de, bi awayekî zelal û aşkere li ser zimanê wan daye der û gihîştîye dongîya xwe. Her wekî ku Casanova bal pê dide û dibêje, “Tevgera neteweyîkirina wêjeyê ew çend serketî bû, şûnewara Wêjeya Fransîyan jî, bi beşeke xwe ya mezin serî li ber vê xurtî û mentîqê tewandibûn û taybetîyên wê yên ‘çanda gel ya herêmi’ di Fransî de jî xuyanîtir bûbûn.” (Yê radiguhêzîne: Casanova, 2010: 123)

Ji hêleke din ve, bandora ramanên Herder ên li ser zimanî û çandî û balpêdana wî ya li ser têgiha ‘gel’ ku hem zimên hem jî neteweyê di xwe de dihevine, yanî bandora ‘şoreşger(îy)ane’ ya Herder; li şûna ku şûnewara wêjeya neteweyên ku di nav Şûnewara Wêjeya Dinyayê de cî negirtine, ji navendê dûr bixe û xweristîya avanîyî ya wêjeya wan neteweyan biguherîne û bike ku ew di perîferîya navendê de bêrê û rêçik doş bidin xwe, berevajîya wê, kir ku ew wêje, şûnewarên xwe di çarçoveya çand û zimanê ‘gel’ê xwe de ava bikin û bi wî rengê xwe tev li Şûnewara Wêjeyên Dinyayê bibin. Ji ber ku; “Mirov nikare, li wan welatan, ew ên ku ji alî wêjeyê ve ‘biçûk’ in, geşedana wêjeyê û hîlbûna ramana ‘neteweyî’ ji hev biqetîne” (Casanova, 2010: 120) bi her hal, hindek netewe hene ku piştî şûnewara xwe ya wêjeyî ava kirine û her çend wekî ‘wêjeyên biçûk û kêmbandor’ tev li Şûnewara Wêjeya Dinyayê bûne jî, rengê wêjeya wan yê neteweyî, wek nîşaneyêke beloq û mandelenekir, daye der.

Her wiha, wêje, wekî têgih û biwareke taybet, wekî wêjeya nivîskî, ji ber ku li ser kaxiz û wekî deq û tekstekê tê dariştin, li ba hemû gel û komên etnîkî, pêwîstî bi zimanekî yekreng û standard dibîne da ku kesên dixwînin bi heman awayî jê fam bikin. Û digel wê jî, zimanê ku êdî nivîskî ye û li ser nivîskîbûna xwe, ‘jêcihêbûn’a xwe jî bi awayekî berbiçav dide der, êdî zimanê neteweyî ye; pê re jî yek ji hêmana xurt û diyarker ya hebûna neteweyî ye.

Şûnewara Wêjeya Dinyayê û Merîdyena Newekhevîyê

Berî dawîya sedsala 19an, Fransa, Îngilistan, Elmanya û ji hêlekê ve jî Spanya, Îtalya û Rûsya şûnewarên xwe yên wêjeyî saz kirine û bi taybetî Fransa û Îngilistan hem di warê sîyasî hem di warê aborî hem jî di warê wêjeyî de xweyî gotin in û şûnewarên ziman û wêjeya wan diyarker e ji bo wêjeyên dîtir ên li Ewropayê.

Her wiha, şûnewarên herî zengîn û kartêker û serwer ên Wêjeya Dinyayê, di heman demê de ew şûnewar in ku ên herî kevn in; serê pêşîn wan di hevrikîya avakirina şûnewarên

wêjeyî û bandorlêkirinên wê ên aborî û sîyasî de cî daye xwe û îro roj, ‘klasîkên’ wan ên neteweyî wekî ‘klasîkên dinyewî û hertimî’ tên qebûlkin. (Valéry, P.: Yê radiguhêzîne: Casanova, 2010: 97) Ev derava hanê, di heman demê de, hem şûnewareke serêbiskêyî li wan şûnewarên ketî behsê dibexşîne hem jî wî heqî bi wan re çêdike ku ew serwerî û desthilatekê li ser şûnewarên ‘wêjeyên biçûk’ bimeşînin ku piştê tev li şûnewara Wêjeya Dinyayê bûne.

Gerdûnîbûna Wêjeya Dinyayê, bi temamî li ser Ewropayê hatiye avakirin û gerdûnîbûn-navneteweyîbûna ketî behsê jî, her wekî Rivarol dibêje, “Li ser pevçûnên neteweyan, yanî li ser hevrikîya di navbera wan de heyî, hatiye avakirin.” (Yê radiguhêzîne: Casanova, 2010: 124) Gava em hinekî din jî bala xwe bi hûrayî dibin ser derava çêbûyî, em dibînin, çêbûna serwerî û avabûna Şûnewara Wêjeya Dinyayê, -her çend di qonaxa berî modernîzmê dest pê kiribe û hê wê hingê neteweyên modern ne behsê xeberê bin jî- bi awayekî xurt û kartêker di qonaxa duyem de, yanî di qonaxa berbelavtîrbûna mêtîngerîyê û di qonaxa şoreşa zimanzanî-ferhengszazîyê û bi taybetî di qonaxa serdestîya cografîk û aborî ya li ser mêtîngerîya Îngilistanê de geşe bi xwe daye û cîyekî xweş û qewîn ji xwe re çêkiriye. Di vê derava cîlixwexweşkirinê de jî, Parîs wekî navendek û şûnewareke wêjeyî û çandî wekî şûngeha hîmî û serwer û Londra jî wekî wekî navendek aborî û sîyasî bi pêş de tê ku bandorê li aborîya wêjeyê jî dike û di şûnewara Wêjeya Dinyayê de dibe navendekê xweyî gotin.

Gava mirov ji derve de bala xwe didiyê, tê dîtin ku ev derava hanê ‘newekhevî’yekê çêdike û her çend Elmanya bi şûnewara wêjeya xwe ya li ser ramanên ‘şoreşger’ yên Herder avabûyî tev li şûnewara Wêjeya Dinyayê bûbe jî, vê yekê tu guherîn di ‘newekhevî’ya ketî behsê de çênekiriye, berevajîya wê, ‘newekhevî’ya heyî zêdetir û kûrtir kiriye. Herçî Merîdyena Greenwich a ku Casanova wekî merceke ‘lixwedanîna’ navendîbûn û serwerîya Şûnewara Wêjeya Dinyayê datîne ber wêjeyên neteweyên dîtir jî vê ‘newekhevî’yê tîne rewşe û asteke wisa ku ne ‘lixwedanîna wê’ ne jî ‘lixwedaneanîna’ wê tu çar(e) bi xwe re çênake. Herî baş û xurt, gotinên Larbaud ‘newekhevî’ya ku em dixin behsê rave û aşkere dike ku Larbaud dibêje, “Her nivîskarekî Fransîz navneteweyî ye, nivîskar û helbestkarên hemû Ewropayê û bi awayekî beşkî jî yên Emerîkayê jî wisan in (...)” (Yê radiguhêzîne: Casanova, 2010: 102)

Ev gotin û dîtînen Larbaud, Wêjeya Fransî, wekî wêjeyekê ‘bêdestpêk’ û ya ‘hemû deman’ qebûl dike û bi taybetî wê li ser Ewropa û dinyayê ferz dike. Helbet Merîdyena Greenwich ku wekî ‘şûnewara’ dîyarkirina destpêkê tê bikaranîn û ast û nirxdarîya wêjeyên neteweyên dîtir li gorî ‘şûnewara’ wê destpêkê tê dîyarkirin jî dibe sedema ‘newekhevî’yekê mezin û kûrdeçûyî. Û dîyarkirina Parîsê ya wekî destpêka Şûna Wêjeya Dinyayê, ne tenê li ser ‘wêjeya neteweyên biçûk’, di heman demê de li ser ziman û wêjeyên welatên wekî

Îngilistan û Elmanyayê jî ‘newekhevî’yekê saz dike û hevrikîya di navbera wan de çêbûyî dixwe rewşeke hertimî.

Di şûnewara Wêjeya Dinyayê de, ev awa zordarî û hikmlêkirina li ser wêjeyên neteweyên dîtir, ne tenê ji bo danqebûlkirina serwerîya şûnewara Wêjeyekê Dinyayê ya navend-Ewropa ye, di heman demê de, lêferzkirineke zimanî û sîyasî ye jî ku “Ziman di vê qonaxê de ne wekî navgîneke wêjeyî ye, di heman demê de, bi awayekî çarneyî alaveke sîyasî ye jî û ji ber hindê jî, ‘dinyaya wêjeyê’ dûçarî pêgirîya sîyasî dimîne.” (Yê radiguhêzîne: Casanova, 2010: 131) Warên ku ji alî sîyasî ve di bin zordariyê de ne, dibe ku di warê ziman û wêjeyê de jî di bin zordariyê de bin. Ger wisa be, ev yek bi xwe re deraveke ‘zordariyên dinavhevdeçûyî’ çêdike.

Ji hêla din ve, bêjara ‘Em yek û wekhev in’ jî heye ku Franco Moretti vê bêjarê, bi awayê xwe yê kitane (singular, tekil) digihîne gotina *Weltliteratur* ku Goethe û Marx bi wateya, sîstema ku li ser hevpêwendîyên wêjeyî ava ye, bi kar anîne. (Moretti, 2022: 1) Moretti, bi pêdeçûnê re, raveya xwe li ser sîstema vê ‘kitanebûn û wekhevbûn’ê dike û dibêje, “Wateya ‘Em yek û wekhev in’ ev e: Çarenûsa çandekê (bi giştî çanda ku ya dorhêlê ye) ji alî çandekê (ew çand: çanda navendê ye) ku bi temamî ‘wê piştguh dike’ ve, li atlehîyê tê qewimandin û çanda dorhêlê ji alî çanda navendê ve tê guherandin.” (Moretti Franco, 2022: 2) Ji vê raveya Moretti, em têdigihîjin ku çandek heye, serwer û hikmlêkir e (piştguhkirin cureyekî tundî û pêkanîna serweriyê ye) û her û her ji bo berbelavbûn û bipêşveçûn û xurtbûna çandekê neserwer dibe kend û kosp û nahêle ew çand di tala xwe re bibe çanda heyî û nas bibe. Û helbet li wî cîyê ku lê desthilat an jî serwerî hebe newekhevî jî heye. Her wiha, serwerî û desthilateke bi vî rengî, bi xwe re kiryarîya ‘liderhiştina’ periferîya sîstema xwerist jî tîne û pê re jî wêjeya serwer û zordar, xwe di navendê de bi cî dike û dorhêl û periferîyeke nû ya li ser feraset û pergala xwe saz dike. Di vê pergala de, heqê diyarkirina çarenûsa xwe ya ‘şûnewarên wêjeyên biçûk’ ne bi destê wan e û ew heta ku ji alî ziman û wêjeyên Şûnewarên Wêjeya Dinyayê ve neyên pesendkirin û pîrozwerkirin, heyî nabin.

Di vê qonaxa nivîsê de, em ê berê xwe bidin têgiheke pêreyî û bêjin; herçî behs pêgirîbûn e, di vî warî de, hin rewşên cuda û awarte hene û “Heke pêgirîya hin war û welatan ne di warê sîyasî de lê belê tenê di warê ziman û çandê de be, -her wekî Awusturya, Swîsre û Belçîkayê- dawîya dawî, zordarî wêjeyê jî dixwe nava xwe.” (Yê radiguhêzîne: Casanova, 2010: 131) Lê belê, ji derveyî awarteyên ku qet ne diyarker in di vî warî de, bi taybetî li welatên ku mêtîngeh in, -û heta qonaxa sêyem ya avabûna Komara Wêjeya Dinyayê jî mêtîngehbûna wan her li dar bûye- zordariya sîyasî ya bi rêya ziman jî li ser wan hatiye kirin. Û ev zordariya ku zimanê xwe li xwe dike ‘çek’ û pê ‘sîya xwe ya reştir’ dadixîne ser warê

mêtingeh, -heta ku mêtingeh wekî netewe azadîya xwe bi dest xwe ve neyîne- nahêle û rê li ber dibire ku şûnewareke wêjeyî ya wan ziman û neteweyan jî ava bibe. Tew di hin deravan de, ji ber ku zordarî û pêkanînên asîmîlekar ên mêtingerîyê li ser warê mêtingeh tèn meşandin, zordarîya ketî behsê zimanê mirovên mêtingehan jî mandele û qedexe dike û hin nivîskarên wêjeyî yên war û welatên mêtingeh, berhemên xwe yên wêjeyî bi zimanê serdestên xwe dinivîsin. Gelek çaran piştî qonaxa bidestxistina azadîyê û avakirina netewe-dewletê jî, yanî di qonaxa postkolonyal de jî, mirovên war û welatên ji mêtingehîyê rizgarbûyî, ger nivîskarên wêjeyê bin, her dikudînin û di berhemên xwe yên wêjeyî de jî zimanê mêtingerîyê bi kar tînin.⁶

Werger; Wekî Rêya Têvlêbûnê ya Ji Bo Wêjeyên ‘Ji Navendê Der’

Heta vê dera gotara me, agahîyên me hildayî û dahûrandinên me kirî, bi me da zanîn û nîşan ku Şûnewara Wêjeya Dinyayê hatiye avakirin û ev şûnewar, her çend zimanên dîtir kartêkekê lê bikin jî, bi taybetî li ser qebûl û pîrozwerkirina Parîsê û Londrayê ava ye û ev her du bajar wekî navendên Şûnewara Wêjeya Dinyayê hatine pesendkirin.

Berhemeke wêjeyî ya ‘ji navendên pîrozwerkirinê der’,⁷ ew berhem e ku ji bo tevlêbûna wê ya li Komara Wêjeya Dinyayê, divê ew pêşî ji alî navendê ve were pesendkirin û pîrozwerkirin. Ev navend, wekî kend û bendeke ku ‘destûra hebûnê dide’ her tim li ber berhemên ‘ji navendê der’ asêkirî ye. Loma jî, ji bo rawirtina ji vê kendûbendê û bidestxistina rê û heqê tevlêbûna Komara Wêjeya Dinyayê, rêyek tenê heye li pêş wan berheman; werger. Bi awayekî lêferzkerî û bi giranî, wergerandina berheman ya bo zimanên Fransî û Îngilîzî, li pêş berhema ‘ji navendê der’ wekî hoy û şertê pêşîn e û ger ew berhem di doza gihîştina Şûnewara Wêjeya Dinyayê de be, çarçevar e bo wan zimanan were wergerandin.

Her wekî me li jor jî behs jê kiribû, Wêjeya Dinyayê ya bi serwerîya ziman û wêjeya Fransî û Îngilîzî û parekî jî ne zêde lê kartêker ji ziman û wêjeya Elmanî ava bûye. Serwerîya Fransî û Parîsê, ji hêlekê ve û parek jê, bi rêya wergerandina berhemên Latînî ya bo Fransî û bi gotina Du Bellay, ‘bi daqurtandin’ a wan û piştî ‘mehandin’ê car din û bi awayekî din û bi zimanê Fransî, bi vejandina berhemên Latînî ava bûbû. Û digel wê jî, Casanova agahîyeke dîtir dide me û dibêje, “Bi mawey sedsala 19an, romantîkên Elmanan bi taybetî klasîkên Yewnana kevn wergerandin ser zimanê Elmanî” (Yê radiguhêzîne: Casanova, 2010: 151) Ev awa kardarî û çalakî, xwelêrakişandineke wek ya Fransîyan e. Tiştê ku divê em ji van agahîyan li xwe bikin par û li ser bisekinin ev e; şûnewara Wêjeya Dinyayê bi xwe jî ne ew

⁶ Di vê mijarê de Salman Rûşdî û Ngûgî wa Thiong’o mînakên berbiçav in.

⁷ Fredric Jameson vê têgihê wekî “Wêjeya Dinyaya Sêyem” bi kar tîne. (Jameson, 2008: 365)

qasî homojen e û her çî qas tê de çalakî û pratîkên ‘daqurtandin’ a zimanî û ‘mehandîn’ a wêjeyî ya li ser afirandineke bi awayekî nû pêk hatibin jî, dawîya dawî, ji ber wergerandinê, reng û nîşaneyên deq û tekstên orîjînal û resen maye tê de. Ev dongîya hanê, şîka me ya li ser homojenbûn û pê re jî ‘xweserbûn’ a şûnewara Wêjeya Dinyayê zêdetir û xurttir dike ku em dikarin bêjin, Elmanan bi rêya wergerandina klasîkên Yewnana kevn wêjeya xwe xurttir kirin û di şûnewara Wêjeya Dinyayê de cî dan xwe û Fransîyan jî, bi rêya wergerandinê, bi taybetî wergerandina berhemên Latînî, li ba xwe, wêjeya xwe ya nûrengpêdayî pîrozwer kirin û loma jî, wan ji ber vê bixwebawerîyê karibû bibin navenda pîrozwerkirina berhemên wêjeyên dîtir ên dinyayê.

Werger, hem ji bo wêjeyên ji ‘navendê der’ hem jî ji bo nivîskarên wan wêjeyan, tekane rê ye ku karibin xwe bigihînin Şûnewara Wêjeya Dinyayê; û tê de werin pesendkirin û pîrozwerkirin. Ev yek, yanî rêya wergerandinê, di heman demê de, awayekî ji awayan, wêjeyîbûna berhemên wan jî pesend dike. Her çend, werger dike ku hevrikîya di navbera serwerên şûnewara Wêjeya Dinyayê de heyî sortir û tûjtir bibe jî, piştî pesendkirin û pîrozwerkirina berhema ji wêjeya ‘navendê der’ hatî wergerandin, heman berhem ji hêla hevrikên din ve jî tê pesendkirin û ew berhem cîyê xwe di şûnewara Wêjeya Dinyayê de xweş dike.

Wergera wêjeyî ku ji berhemên zimanên ‘ji navendê der’ bo zimanên navendê tîn kirin, di heman demê de, wêjeya navendê zengîntir dike. Wêjeya navendê ku bi ‘xweserbûn’ a xwe ve li hafa jor e û serwerîya xwe dimeşîne, bi wergerandina hin xweserî û taybetîyên berhema ji wêjeya ‘ji navendê der’ digihîje wê hêza ku dikare xwe pê biguherîne û pê re jî çavkanî û derfetên ku ji wêjeyêke perîferî û derdorê gihîştine wê, hêza xwe xurttir û hafa xwe jî bilindtir bike. Yanî, mebest ji vê gotina me ev e; gava berhemeke ji wêjeya ‘ji navendê der’ bo zimanê wêjeya navendê, -Fransî, Îngilîzî û Elmanî- wergere, ne tenê wêjeyîbûna berhema wêjeya ‘ji navendê der’ tê pesendkirin û piştî qebûlekê tê pîrozwerkirin, di heman demê de, çavkanî û derfetên vegotinê yên wêjeya ‘ji navendê der’ jî tev li wêjeya navendî dibin û wêjeya navendî, xweserî û taybetîyên wêjeya ‘ji navendê der’, di wate û çarçoveya Du Bellay dîyar kirî de, ‘dadiqurtîne’ û piştî ‘mehandîn’ a wan taybetîyan, mîna ku yên wê bi xwe bin, di rengê xweserîya xwe de dide der; yanî wekî dongî, dîsa ya ku ji vê çalakîyê bêtir kelkê hildide û pê xurttir û berbelavtir dibe, wêjeya navendî ye.

Her wiha, çalakî û pratîka wergerandinê ya berheman ya ji zimanên ‘ji navendê der’, ji alî nivîskaran ve û bi çend şeweyan û bi awa û tercîheke kesaneyî jî tîn kirin. Awayekî wergerê ku bi gelek mebestan tîn kirin ev e; nivîskar bi xwe an jî wergêrên wêjeyên ‘ji navendê der’, berhemên ji şûnewarên Wêjeya Dinyayê ku navenda pesendkirin û

pîrozwerkirinê ne, werdigerînin ser zimanê xwe û ev awa çalakîya wergerê hê jî didome ku em dikarin têgiha wê ji Casanova deyn bikin û ji bo wergera bi vî rengî bêjin, ‘wergera ber bi hundir ve.’ Digel wê jî, rengê dîtir yê wergerandinê heye ku berhemên ji wêjeyên ‘ji navendê der’, ji alî nivîskar an jî wergêrên wê wêjeyê ve bo zimanên serwer ên şûnewarên Wêjeyên Dinyayê tên wergerandin ku em ji bo wê dikarin bêjin, ‘wergera ber bi derve ve.’

Helbet, di şûnewarên wêjeyî de, “Ji bo girseyeke ku ji xwendoxên gerdûnî pêk hatine, wergera çandî hewldan û xebtûkoşeke zêde divê. Ev hewldan, carinan wergêran çarneçar dike ku rasterast wergerandina zimanî bikin.” (Damrosch, 2010: 128) Wergera ketî behsê, bêtir ji bo wan nivîskaran e ku bi zimanê wêjeyên ‘ji navendê der’ dinivîsin û ew bi xwe berhemên xwe werdigerînin ser zimanê serwer an jî di gava wergerandinê de alîkarîya wergêran dikin. Ji ber ku werger, ne tenê ew tişt e ku berhemek ji zimanekî diqulibe ser zimanê din. Di heman demê de, wate ji wergerandinê ev e: Berhema bo zimanekî hatî wergerandin, êdî di wî zimanî de jî dibe wêjeyî. Loma jî, “Nivîskarên bizavê ‘boom’ ên Emerîkaya Latîn, piştî ku berhemên wan bo Fransî hatine wergerandin û ji alî rexnegirên Fransî ve hatine pesendkirin û pîrozwerkirin, karibûne di şûnewarên Wêjeya Navneteweyî de heyî bibin. Û wekî dongîya vê çalakîyê, Jorge Luis Borges gotiye, ‘ez bi xwe dahênanê Fransayê me.’” Digel wê jî, sedema ku Rabindranath. Tagore bi awayekî navneteweyî hat naskirin (xelata Nobelê wergirt) ew e ku; wî bi xwe, berhemên xwe wergerandiye Îngilîzî.” (Yê radiguhêzîne: Casanova, 2010: 152-153) Ev her du mînak, gelek balkêş û têra xwe jî aşkere ne û agahîyeke zelal dide me ku em karibin bêjin; ji bo ku berhemeke ji wêjeya ‘navendê der’ karibe xwe bigihîne şûnewara Wêjeya Dinyayê û were pesendkirin û pîrozwerkirin, rêya herî sereke û yekane ew e ku ew berhem bo zimanên şûnewarên Wêjeya Dinyayê, -yanî bo Fransî, Îngilîzî û Elmanî- were wergerandin.

Şûnewara Wêjeya Kurdî; Wekî Wêjeyêke Di Bin Zordariyê De

Serê pêşîn, divê em bêjin; em bi pêşqebûlekê têgiha Şûnewara Wêjeya Kurdî bi kar tînin. Ev qebûla hanê ne ji ber dîyardayan e lê belê ji ber şûnewara berbiçav e ku ji alî dîrokî, çandî, zimanî û neteweyî ve hatiye pê û şaxeke wê ya ku ew ê berbelavî û qebûla giştî ya gerdûnî jî bîne pê, kêma û kûta maye.

Em bi bikaranîna têgiha Şûnewara Wêjeya Kurdî, behsa wê wêjeyê dikin ku ji serî de, bi gotineke din, di dema avakirina şûnewara xwe de, her çend wekî gelek neteweyan ne xweyî dewletekê be jî, bi awayekî felaket û ji alîyekî ve jî mucîzewî, dest bi nivîsîn û afirandina berhemên wêjeyî kiriye. Belê em behsa hebûna berhemên wêjeya klasîk û ya Şûnewara

Wêjeya Kurdî ya klasîk dikin ku Paul Valéry klasîkan wekî “serêbiskêyên neteweyên wêjeyî ên herî kevn” bi nav dike. (Yê radiguhêzîne: Casanova, 2010: 29)

Loma jî, em ê ancax bi destpêka wêjeya Kurdî ya klasîk ve karibin ji têgih û derbirana Şûnewara Wêjeya Kurdî fam bikin. Di vî warî de, me “Sê Gewreyên Gewherî” (Zeraq, 2022: 83) hene ku bingeha Şûnewara Wêjeya Kurdî ya klasîk danîne û paşê bi peydebûna peyrewên wan jî Şûnewara Wêjeya Kurdî ya klasîk ava bûye.

Gewreyê pêşî û yê serkêş; Melayê Cizîrî.

Dem, sedsala 16an, gava Cizîrî, bi helwesteke dijdesthilat, li ber serwerîya zimanî û wêjeyî ya 'Erebî û Farisî⁸ radibû û (li gorî daneyên heta vê çaxê, yên di destê me de) berhema yekem ya wêjeya klasîk dinivîsî, di heman demê de, derzek di serwerîya zimanî ya 'Erebî jî de jî çêdikir ku 'Erebî jî alîyekî ve jî ev serwerî û pîrozî ji ber dîne Îslamê jî xwe re peyde dikir. Û hema di heman gav û salan de, Fransayê qolinca xwefilitandina ji serwerîya Latînî dikişand û Du Bellay pêşnîyaz dikir ku hin hêmanên zimanî û wêjeyî yên ku di Fransî de geşe bi xwe nedane an jî tune ne, bi rê û rêbaza 'daqurtandin' û 'nivîsîna bi şêweyekî din' ji Latînî werin wergerandin. Û ev her du bizav û çalakîya ku dibûn binas û egerên avabûna şûnewarên wêjeyên du zimanên, du çandên, du neteweyên ji hev dûr û cuda, di heman gavê de û li dû bajarên cuda, li Cizîrê⁹ û li Parîsê, pêk dihatin.

Ger pêwîst bike em danberhevek di navbera van her du bizavan de bikin, em ê karibin bêjin:

1. Gava Du Bellay, ji bo xurtkirina Fransî, banga wergera berhemên wêjeyî yên Latînî bo Fransî dikir, Cizîrî bêyî ku hêmaneke wêjeyî ji 'Erebî an jî Farisî wergerîne Kurdî, bi derfet û zengînîya Kurdî dima û dîwana xwe dinivîsî.
2. Gava Du Bellay, rê û rêbaza 'daqurtandin' û 'nivîsîna bi şêweyekî din' dikir, Cizîrî bi rêbaza 'beloqkirin' û pê re jî 'mehandin'ê peyvên 'Erebî û Farisî di dîwana xwe de bi kar dianî û ew dikirin milkê Kurdî.
3. Gava digel Du Bellay gelek giregir û wêjekarên Fransî hewl didan ku Parîsê bikin navend û şûnewara pîrozwerkirina wêjeyî ya Ewropayê, Cizîrî bi tevî dîwana xwe ve di nav sînorên bajarê Cizîr û Kurdistanê de asê dima.

⁸ Li ser daneyên gelek dîrokzanên wêjeyê ku êdî ev agahî bûye agahîyêke anonîm, em Erebi û Farisî, ji alî zimanî û wêjeyî ve, wekî Şûnewarên Serwer yên wê serdemê qebûl dikin û vê derbirana hanê dibêjin.

⁹ Cizîr ji dîrokê de yek ji bajarên Kurdan e û ew ê her wekî bajar bimîne. Divê em bi awayekî bêguman bêjin û qebûl bikin; bajarên Kurdan yên dîrokî yên heta salên 1930yî heyî, divê ji hîş û bîra me neşiqite û em vê rastîni û hebûna xwe ya meşrû û hebûnîyê, li ser feraseta fermîbûna Komara Tirkiyeyê nerizînin.

4. Gava Fransa wekî dewletekê, hewl dida ji alî çandî û wêjeyî ve Parîsê bike yek ji navenda mezin û xweyîhikm ya Ewropa û dinyayê, Kurd bi awayekî ji hev parçe parçe, ji alî mîrektîyan ve dihatin birêvebirin û serdestên rayedar û rêveberên Kurdan, her yekî ji serîyekî hikm datanî û bajar-navendeke (yanî paytexteke hevpar) sîyasî û aborî û leşkerî ya Kurdan ava nedikirin.

Her wiha, pêknehatina xalbandên sêyan û çaran ya li ba Kurdan, dikir ku helwest û kardariya hevdem ya Cizîrî ya bi Du Bellay re û dahênana wî ya dijdesthilat û *deconstructionist*, berbelav û berfireh nebe û tenê di nav sînorên Kurdistana wê hingê de teng û asê bimîne.

Gewreyê duyan; Feqîyê Teyran

Hê sed sal berî hatina Herder, Kurdan Feqîyek hebû; wî alaya Cizîrî daçikandî, ji wê şûna ku Cizîrî kêr hiştibû, hildida û berê wê alaya wêjeyî dida şûneke dîtir û berbelavtir. Feqî, digel mîrateya awayê nivîsîna Cizîrî, yanî digel 'daqurtandin'a hêmanên ziman û wêjeyên dîtir ên serwer, ber û bala xwe dibir ser serwertirkirin û berzûbalatirkirina hêmanên gel ên çandî û folklorî. Di vî warî û di vê qonaxê de, têgiha 'gel' ya Herder avakirî, berî sed salekî yê hatina Herder, li ba Kurdan dida der. Feqî, wekî desthilata ku bi kêrî yekbûna sîyasî ya Kurdan nayê, rû ji mîrektîya Miksê ba dida, awir û riwangeya xwe ya nivîsînê jî dida hêla gel; û bi vê helwesta xwe ve jî, helwesta dijdesthilat ya Cizîrî ku ji bo desthilat û serdestîya derveyîn nîşan dabû, di deqbanda (konteksta) navxweyî de li dar dixist. Loma jî, Feqî di dîwana xwe de, rengê zimanê gel jî xwe re dikir hîm û esas û dastana Zembîlfiroş ya ku nêzikî şeş sed sal berîya çêbûna wî qewimîbû û di nav gel de berbelav bû, dinivîsî û bi şeweyê zimanê xwe jî dikir ku gel bêtir jê hez bike û bawerîya gel bi hebûn(îy)a xwe re xurttir bibe û gel bibîne ku 'dastan-çîrokên wî' bi zimanê wî jî tê nivîsîn. Feqî, bi vê ranêzikî û perspektîfa xwe ve, dibû xelekê duyan yê avabûn-avakirina Şûnewara Wêjeya Kurdî ya klasîk.

Gewreyê sêyan; 'Ehmedê Xanî.

Hê Fransîyan şoreşek tunebû li rastê û hê behs ji têgiha 'gel'a Herder û 'neteweya' Şoreşa Fransîyan tunebû, Xanî -digel bilêvkirina peyvên 'Ereb, 'Ecem, Turk, Rom, Tacîk, Gurc û Faris û bi balpêdana jihev cudabûna gelan û qewman- Kurdbûn (bi gotina Ekrad), dixist behsê¹⁰ û alaya her du gewreyan daçikandî, hildida û di warekî, di şûngeheke dîtir ya kêmmayî de dadiçikand. Xanî, xelesa sêyem ya Şûnewara Wêjeya Kurdî ya kêmmayî, yanî

¹⁰ Xanî, 2008: 38-39-40 (Em bêyî ku têkevin ber şaşîtiya anakronîk û 'neteweya modern-kapîtalîst' û 'gel-xelkê etnîk û qewmî' tevî hev bikin, wekî ferasetekê, wekî hayjêbûnekê, wekî ramanekê cînegirtî vê balpêdanê dikin.)

hêla sîyasî ya Kurdan, di ser xwedîtîlêkirin û berfirehtirkirina awayê nivîsîna Cizîrî û Feqî re, yek ji dastana Kurdan ya herî berbelav, dastana Memê Alan, ji bo alaya Şûnewara Wêjeya Kurdî dikir hîm û şîva daçikandinê û bi nivîsîna Mem û Zînê, berê rayedarên Kurdan dida hêla hîmî û avakar ve.

Berîya sedsala 18an, berî ku li Parîsê, li Ewropayê, Şûnewara Wêjeya Dinyayê ava bibe, *Her Sê Gewreyên Gewherî* yên Kurdî, digel ku serwerîya zimanî ya 'Erebî û serwerîya wêjeyî ya Farisî li derdora wan li dar bûye jî, li warê xwe, li Kurdistanê û li Rojhilata Navîn, ji warekî dûrî Ewropayê ku niha bi her sê zimanên xwe ve serwer û dîyarkera Wêjeya Dinyayê ye, bûne hîm û avakar ji bo Şûnewara Wêjeya Kurdî ya klasîk.

Em wekî dawî ya li ser vê avabûna Şûnewara Wêjeya Kurdî ya bi hîmên zexm û xurt, dikarin bêjin; Peyrewên *Her Sê Gewreyên Gewherî* yên Wêjeya Kurdî ya klasîk, xweşikî nikaribûne xweyîti li şûnewarê bikin; li şûna ku gav bi gav xwe ji teşeyîbûn û bisînorbûna ş'ira klasîk bidin alî û ş'ira Kurdî hilkin asteke dîtir û şûnewareke dîtir a hundirîn û naverokî û şêwazî jê re ava bikin û peyrewên ku çîrok û romanên dinivîsin bigihîjînin, tenê bi texlîtîkirin û dubarekirina her sê gewreyan mane û berhemên xwe dane. Di vê dema berhemdanê de, her wekî helwesta şoreşgerîyane ya Herder, berhemên xwe negihandine komên xelkê û di warê xwendoxî û xwendewarîya bi Kurdî de ew şîyar û zane nekirine. Û ev yek, ji bo şûnewara Wêjeya Kurdî, wekî kêmayîyeke girseyî maye li rastê ku Herder, berevajîya wê, bi pêkanîn û temamkirina van kêmayîyan kiriye ku gelê Elman li xwe şîyar bibe, rabe ser xwe û li ser ziman û çanda xwe, berê xwe bide yekbûna neteweyî da ku şûnewera Wêjeya Elman bibe hevrika du şûnewarên din ên qerase; şûnewarên Wêjeya Fransîyan û Îngilîzan.

Herçî ev derava hanê ku peyrewên *Her Sê Gewreyên Gewherî* yên Şûnewara Wêjeya Kurdî, ji bo geşedana Şûnewara Wêjeya Kurdî, bi xurtî û xweşikî bi kar û rola xwe ranebûne, her çend wekî kêmayîyeke şûnewara wêjeyî xuya dike jî, helbet em ê karibin bêjin, tu şûnewareke wêjeyî, bêyî piştgirî û hebûna hêz û navendeke sîyasî û aborî xweşikî nikare şûnewara avabûyî-avakirî bike ya hertimî.

Loma jî, me divê em di vê qonaxê de bala xwe bibin ser desthilata sîyasî û aborî ya Kurdan ya wê hingê ku wek min li jor jî got, di navbera serdemên 16an û 17an de, ji danîn û avakirina yekbûna Kurdan zêdetir, mîrektî, 'eşîr û desthilatdarên Kurdan bi hev ketine û ew hiş û feraset bi wan re çênebûye ku li ser xatirê zimanê xwe, qet nebe wekî zaravaya Kurmancî ku piranîya Kurd pê diaxivin, bên ba hev, zaravaya Kurmancî li xwe bikin sedema yekbûnê û desthilateke 'xelkî-etnîkî-neteweyî' daynin û bi vî awayî, wekî Kurmanc, desthilata xwe ya navxweyî li Kurdên dîtir jî dîyar bikin, pê re jî Kurdên din jî di nav vê desthilatê de bihewînin û berîya Herderê Elman, guh bidin Xanî û aqil bikin û bi hûrayî û kûrayî li ser

ramana Xanî bimînin û bi danîna desthilata xwe ya sîyasî û aborî (û pê re jî leşkerî) bibin bingehêke zemînî ya ji bo herheyîbûn û berbelavbûna Şûnewara Wêjeya Kurdî.

Gava dem û sal çûne û êdî dawîya sedsala 20an e, Şûnewara Wêjeya Dinyayê bi giştî li ser her sê zimanên Ewropî, -Fransî, Îngilîzî û Elmanî- ava bûye û neteweyên ku ji sedsala 17an heta wê hingê 'neteweyên biçûk'¹¹ bûne, bi avakirina yekbûna xwe û dewleta xwe ya neteweyî û bi danîna şûnewareke xwe ya wêjeyî ve, êdî li ba Şûnewara Wêjeya Dinyayê wekî şûnewarên hêjayî qebûlîkirin û pesendkirinê hatine dîtin.

Herçî Kurd in, hem wekî gel-xelk-*netewe* hem jî wekî şûnewara wêjeyî, berevajîya dinyayê li xwe qewimandine û ji hemû alîyan ve, dem û sal pê de, biçûktir bûne û gava sal û dem hatiye dawîya sedsala 20an, Kurd êdî ne wekî şûnewareke wêjeyî xweyî berhem û gotin in ne jî wekî gel-xelk-*netewe* xweyî desthilat in; Kurd, piştî salên destpêkî ên sedsala 20an, gel-xelk-*netewe*ke biçûkkirî, bi parçeyan çaralîkirî û ji alî rêveberî û pergala mêtîngerîyê ve bindestkirî ye. Loma jî, hewldanên ku ji sala 1898an heta bi 1918an, di warê wêje û nivîskarîya Kurdî de hatiye dayîn, ne karibûye di warê wêje û berhemên klasîk de şûnewara her sê gewreyan ava kirî geştir bike ne jî karibûye bi berhemên ji wêjeya modern şûnewareke nû û xurt ava bike.

Piştî sala 1923yan, êdî arîşe û gelemşeyên dîtir ên Kurdan hene. Kurd, hem wekî ax û welatê xwe hem jî wekî gel-xelk-*neteweya* xwe bûne çar beş û çar parçe. Û di her beşê de jî, pêkanînen pergala mêtîngerîyê li wan hatine qewimandin; zimanê wan ji hemû alîyan ve ji keys û derfetan hatiye birîn û hatiye berbendkirin û ji alî berhemanîna wêjeyî ve ketine deraveke teng. Di helûmercên bi vî rengî de, şûnewara her sê gewreyan avakirî, maye wekî şûnewara Wêjeya Kurdî ya klasîk.

Ev derava hanê, heta destpêka sala 1930yî dikude. Piştî ku Erebe Şemo di nav Kurdên Qavqazê de romana pêşî ya bi Kurdî dinivîse û pê re jî Kovara Hawarê derdiçe, di biwara wêjeya modern de livek li wêjeya Kurdî dikeve. Ev çalakî û hewldan, têr dike ji bo ku em karibin bêjin, jê û şûnde Şûnewareke Wêjeya Kurdî ya Modern dest bi avakirinê dike. Tevî ku ev her du hewldan û çalakîyên wêjeyî, ji hev kêmhay û wekî ax û şûngeh (mekan) ji hev gelek dûr diqewimin jî, têr dike ku em bêjin; jê û şûnde êdî Wêjeya Kurdî ya Modern, beraqûbet û xuyanî ye.

Ev her du hewldan, nivîsîna romana pêşî ya Kurdî û derçûna kovara Hawarê, di çarçove û derfeten xwe yên heyî de, hêjayî balpêdanê ne. Ji ber ku bi van hewldanan, Kurdên li hev çarbeşbûyî, bi derfeten kêmhay û tengkirî be jî, hay ji çalakîyên bi wî rengî dibin û li

¹¹ Her wekî ku têgih di lîteraturê de jî li dar e, Mebest ji têgihê 'neteweya biçûk', ew netewe ne ku dewleta xwe ya neteweyî ava nekirine.

Başûrê Kurdistanê, ku wê hingê zimanê Kurdî li wir, bi awayekî sînorkirî, serbest e, wekî hejmar hindik be jî, berhemên wêjeyî tên afirandin.

Piştî salên 1960î, li her parçeyên ku Kurd lê ne, li Qavqazê û li dîasporaya Ewropayê, bi taybetî roman û çîrok, berhemên ji wêjeya modern tên danîn. Ev derav, tevî ku bi dehan salan dikude jî, wekî hewldanekê, dibe egereke avabûna Şûnewareke Wêjeya Kurdî ya Modern û di roja îroyîn de, em dikarin bêjin, belê şûnewareke Wêjeya Kurdî ya Modern heye lê ev şûnewar tenê di çarçoveyêke teng de û bi hevpêwendîyên Kurdan bi xwe de li dar e û hê dûr e ji nasîn û pesendkirin û pîrozwerkirina ji alî Şûnewara Wêjeya Dinyayê ve.

Arîşeya Wergerê ya di Şûnewara Wêjeya Kurdî de

Werger, ji bo Şûnewara Wêjeya Kurdî ya Modern, çalakîyeke pir nû ye. Wêjeya Kurdî ku piştî sala 1923yan, ji yekparçebûna xwe ket û bû çar beş û parçe, di her parçeyê de, bi awayekî din û li gorî pêkanînen mêtîngerîya ku zordarî li serê dike, reng û teşe da xwe. Ji ber vê rewşê, em ê ji vê qonaxê û şûnde, têgiha Şûnewara Wêjeya Kurdî ya Modern, tenê ji bo Wêjeya Kurdî ya li bakurê Kurdistanê bi kar bînin.

Her çend, di kovara Hawarê de, bi rêbaza adaptasyonê çend werger hatibin kirin jî, çalakîya wergerê ya li bakurê Kurdistanê, ji ber qedexetîya li ser zimanê Kurdî ya ku pir bi xurtî tê meşandin, heta dawîya salên 80yî nayê xuyan. Di sala 1979-80yî, di çar hejmarên kovara Tîrêjê de, hejmareke pir kêm wergerên helbest û çîrok ji zimanê Tirkî bo Kurdî hatine kirin. Ev awa werger, helwest û çalakîya wergera ‘ber bi hundir ve’ ye. Digel wê jî, di sala 1968an de M. E. Bozarslan Mem û Zîn a Xanî, bi çalakîyeke wergerandinê ya ‘ber bi derve ve’ wergerandiye ser zimanê Tirkî. Di helûmercên normal de ku ziman û wêjeya neteweyekê, ji alî gerdûnî ve, hem wekî sîyasî û aborî hem jî wekî zimanî û wêjeyî hatibe pesendkirin, ev awa werger, ‘wergera ber bi derve ve’ tê pênasekirin. Lê belê, gava M. E. Bozarslan Mem û Zîn werdigerîne ser zimanê Tirkî, Kurd di nav sînorên Tirkiyeyê de hem wekî neteweyî hem jî wekî ziman û wêjeyî di bin zordarî û çewisandinê de ne û çalakîyên bi zimanê Kurdî qedexekirî ye. Loma jî, wergera bi vî rengî, ‘wergera berevajî’ ye ku tu zengînî tev li wêjeya ‘neteweya biçûk’ nake.

Di sala 1992yan de, çalakîyên wergerê, yên bi rêbaza ‘ber bi hundir ve’, li ser armanca zengîntirkirina zimanê Kurdî û wêjeya Kurdî, bi weşandina kovara Rewşenê ve dest pê dike. Her çend di hejmara 3yan ya kovara Rewşenê de, nivîsareke li ser zimanzanîyê ya ji Pierre Lecoq ji zimanê Fransî bo Kurdî tê wergerandin jî, “Wekî wergerên nivîsarên wêjeyî, di hejmara 4an ya kovara Rewşenê de jî, çîrokeke modern ya ji Farisî ya bi navê “Xelex” ku nivîskarê wê wekî V. Sologob hatiye dîyarkirin, ji alî P. Cîhanî ve hatiye wergerandin.”

(Zeraq 2022: 222) Bi destpêka vê çalakîya hanê, çalakîya wergera zimanî û wêjeyî ya di kovarê de dikudin, wek hejmar zêdetir dibin û piştî weşana kovara Jiyana Rewşenê, êdî çalakîya wergera wêjeyî, wekî bizaveke ji Şûnewara Wêjeya Kurdî ya Modern bi pêş de tê û dem pê de, xurttir û berfirehtir dibe. Di sala 2004an de jî kovara Rewşen-Name dest bi weşanê dike. Digel ku di pêşgotina kovarê de balpêdan bo wergerê tê kirin jî, di heman hejmarê de, nivîskar w. mazlum doğan,¹² nivîsareke bi navê “haveynê ronesans û geşedanê raguhestîna e” dinivîse ku di rengê ‘manîfestoya bizava wergerê’ de ye. (Rewşen-Name, 2004: 6-7-8-9) Çalakîya wergera ‘ber bi hundir ve’, ya ku bi weşana kovara Rewşenê dest pê kiribû û bi kovara Jiyana Rewşenê gihîştibû asta xwe ya jortir û berbelavtir bûbû, bi kovara Rewşen-Nameyê û bi nivîsara w. mazlum doğan ya manîfestoyî, di Şûnewareke Wêjeya Kurdî ya Modern de dibe rê û rêçika çalakîya wergerê ku berê wê her tim ber bi ‘wergera ber bi hundir ve’ ye.

Tevgera Ronesansa Zimanî û Wêjeyî ya li bakurê Kurdistanê, bi tevî bizava wergerê, bi kovara Rewşenê dest pê dike, bi kovara Jiyana Rewşen û Rewşen-Nameyê ve jî dibe qonaxeke girîng û dîyarker ya “qonaxa geşedanê” (Zeraq, 2022: 288) ya di avakirina Şûnewareke Wêjeya Kurdî ya Modern de.

Ji hêleke din ve, wekî parçeyekî Şûnewara Wêjeya Kurdî ya Modern, li dîasporaya Ewropayê, hejmareke nivîskarên Kurdî, digel weşandina berhemên wêjeyî yên wekî çîrok û roman, beşdarî û tevkarîyeke hêjayî balpêdanê li avabûna Şûnewara Wêjeya Kurdî ya Modern dikin. Nivîskarên dîasporayê, di nava xwe de bi sê awayan helwest girê didin: Awayê pêşî, berhemên xwe, tenê bi Kurdî dinivîsin û bi tu zimanan nadin wergerandin û tenê dimînin di nav sînora û çarçoveya Şûnewara Wêjeya Kurdî ya Modern de. Awayê dî, berhemên xwe bi Kurdî dinivîsin û bo zimanên din jî didin wergerandin. Awayê dîtir jî, hem berhemên xwe bi Kurdî û bi zimanên dîtir (tê de zimanê Tirkî jî heye) dinivîsin hem ew bi xwe ji zimanên dîtir yên Ewropayê wergerê bo Kurdî dikin hem jî berhemên wan bo zimanê Tirkî û bo hin zimanên Ewropayê tînin wergerandin.¹³

Lê belê, di deqbanda (konteksta) ‘wergera ber bi hundir ve’ de, hin arîşe û nelihevîyên berbiçav pêk tên. Hin nivîskarên dîasporayê, bêtir ku berhemên wan li zimanekî Ewropayê wergere, piştî demekê ji derçûnê, berhemên wan bo zimanê Tirkî tînin wergerandin. Hin ji nivîskaran jî, piştî ku berhemên wan li hin zimanên Ewropayê tînin wergerandin, îcar bo Tirkî jî tînin wergerandin. Ev yek, ji alî wêjeyên ku di bin zordariyê de ne û ji alî xwegihandina li Şûnewara Wêjeya Dinyayê ve, nelihevî û arîşeyeke berbiçav datîne rastê:

¹² Nivîskar di kovarê de navê xwe wisa, yanî bi tîpên biçûk, nivîsiye.

¹³ Ji bo vê yekê Mehmed Uzun mînaekeke berbiçav e.

1. Nivîskarên dîasporayê; yên ku berhemên wan serê pêşîn bo zimanên Ewropayê tên wergerandin û ji alî rexnegir û derdorên wêjeyî yên navendên pesendkirin û pîrozwerkirinê ve nayên qebûlkirin, hêvîya xwe ji tevlêbûna Şûnewara Wêjeya Dinyayê dibirin û berê xwe didin zimanekî wekî Tirkî ku yek ji zimanê serdestên mêtînger yên Kurdan e û berhemên wan nivîskaran bo wî zimanî tên wergerandin. Ev awa helwest û kardarî, ji bo wêjeyê wek Wêjeya Kurdî, tu çareserîyê bi xwe re nayîne. Şûnewara Wêjeya Tirkî ku piştî wergirtina xelata Nobelê ya Orhan Pamuk, ji alî navendên Komara Şûnewara Wêjeya Dinyayê yên pîrozwerkirinê ve hat pesendkirin, ne ew pir û biwara têrebihurînê ye ku berhemeke ji Wêjeya Kurdî bi rêya wê xwe bigihîne Şûnewara Wêjeya Dinyayê.
2. Nivîskarên dîasporayê; yên ku berhemên wan bo tu zimanekî nehatiye wergerandin û serê pêşîn bo zimanekî wekî Tirkî tên wergerandin jî, bi ber şîpa ‘wergera berevajî’ dikevin. Ji ber ku; zimanê ku berhemên ji Şûnewara Wêjeya Kurdî ya Modern bo wî tê wergerandin, zimanê serdestan e ku serwerîya wî zimanî, zordarîyê li zimanê wê berhemê û şûnewara wêjeya wê dike. Ê ew berhema bo zimanê serdest hatî wergerandin, berî ku bi ‘wergera ber bi derveyî ve’ bigihîje Şûnewara Wêjeya Dinyayê, li dora asêkirî ya ‘wergera berevajî’ dimîne.

Di qonaxa duyem ya demajoya avabûna Şûnewara Wêjeya Dinyayê de, gelek nivîskarên Ewropayê yên ku neteweyên wan ji hêla sîyasî û axê ve bindest in an jî wekî ‘neteweyên biçûk’ hê di qada Wêjeya Dinyayê de nayên naskirin an jî netewe-dewleta wan hatiye avakirin lê berhemên wan hê di Şûnewara Wêjeya Dinyayê de nehatine pesendkirin û pîrozwerkirin, berhemên xwe bi awayekî ji awayan wergerandine bo zimanên Fransî an jî Îngilîzî.

Me li jor jî bal bi nivîskarên bizavên ‘boom’ ên Emerîkaya Latîn dabû û behsa Tagore kiribû. Casanova agahîyên zêdetir û girîngtir dide me:

1. Herçî James Joyce e, wekî yek ji nivîskarê Îrlandî ku mêtîngeha Îngilîstanê ye, berhema wî pêşî li Dublînê hatiye neyînkirin (redkirin) û piştê jî li welatê xwe û li hemû warên Îngilîstanê hatiye qedexekirin. Loma jî, wî bi awayekî sirgûnîya dilxwazî berê xwe daye Fransayê û Parîsê hembêza xwe jê re fireh kiriye û bi saya wergera Larbaud, Joyce di Fransî de hatiye pesendkirin û pîrozwerkirin. Ji vê agahîyê em têdigihîjin; Ne ku Joyce, ji ber ku bi tewrekî teribandî û şikandî ya zimanê serdestê xwe yê mêtînger, ku nav lê dikin ‘wêjeya mînor’, nivîsiye û ji ber hindê jî bi berhema xwe ve tev li Şûnewarê Wêjeya Dinyayê bûye, naxêr, Joyce, ji ber ku hevrikîya di navbera Fransa û Îngilîstanê de heyî bi kêrî xwe anîye, berhema wî di ser Fransî re hatiye pesendkirin û pîrozwerkirin.

2. Herçî Nabokov e, pêşî berhemên xwe bi Rûsî dinivîse, berhemên wî ji alî navenda pesendkirinê ve nayên qebûlkin. Ew jî berê xwe dide Parîsê, li wir bi cî dibe û serê pêşîn alîkarî bi wergêr dike û pê re berhema xwe werdigerîne Fransî û rexnegirên wêjeyê yên Fransî, bi pesndayîn û berzkirina berhema wî, wêjeyîbûna berhemên wî pesend û pîrozwer dikin. Tew Nabokov pê jî namîne, bi wergera bo Îngilîzî ya berhemeke xwe qayîl nabe û radibe ji bo ku di Îngilîzî de jî were pesendkirin û pîrozwerkirin, ew bi xwe berhema xwe werdigerîne bo zimanê Îngilîzî. (Yê radiguhêzîne: Casanova, 2010: 145-152-153-156-157)

Me divê em li vê derê bêjin; Wekî çawa Casanova dibêje, “Paris, tu carî eleqe nedaye wan nivîskarên ku ji mêtîngehên wê derketine. Tew bi qasî demeke zêde jî; mîna ku ew tenê ji herêmên gundewar ên Parîsê bin û tu cudatîya wan ji Parîsê tune be û bi qasî endamên malbatê nêz bin ji Parîsê re, reftar bi wan nivîskaran re kiriye û pê re jî mîna ku ew nivîskar bi qasî ku mirov wan nebîne ji ber çavan dûr bin, ew dane xuyanê û bi cireke nexweş pêwendî bi wan re danîye. (Casanova, 2010: 139) Ev awa helwest û reftar, dûhêlibûn-durûyîbûna Parîsa serdest û mêtînger e ku yek ji navenda pîrozwerkirinê ye. Ew ji hêlekê ve, ji ber ku pê re di nav berebezî û hevrikîyeke serwerîyê de ye, hembêza xwe ji nivîskarên mêtîngerên hevrikên xwe re firehtir dike û wêjeyîbûna berhemên wan pesend û pîrozwer dike, ji hêla din ve jî, reftareke dîtir bi nivîskarên ji mêtîngehên xwe re dike û wan an bi nêzkirinê an jî bi dûrkirinê, tune û wînda dike.

Şûnewara Wêjeya Dinyayê; ne ew war û şûnewar e ku yekser bi helwest û ramanên ‘gerdûnîbûn’ê hatiye danîn û qebûlkin, berevajîya wê, Şûnewara Wêjeya Dinyayê ya pîrozwerkirinê ya ketî behsê, bi bingeha xwe ve, li ser zimanên neteweyî û li ser hîma hevrikî û şerê serwerî û desthilatî yên netewe-dewletên Ewropayê yên mêtînger ava bûye û piştî qonaxa bidawîkirina marastina mêtîngerîyê jî, nexşên kirasê avanîya xwe, mîna ku ji “xweserîya wêjeyî” pêk hatibe, daye der û di roja îroyîn de jî, bi giştî û bi taybetî Parîs û Londra û pê re jî Newyork, wekî navendên pesendkirin û pîrozwerkirina wêjeyîbûn û ‘xweserbûn’ a berhemên wêjeyî tînan û qebûlkin.

Wekî encam:

Li ser agahîdayîn û agahîhildan, dahûran û pêdeçûna me ya heta vê qonaxê, em di warê avakirin-avabûna şûnewareke wêjeya zimanekî de, gihîştine van şertên hanê ku bivênevê ne.

1. Divê zimanekî neteweyî hebe, yê ji alî Şûnewara Wêjeya Dinyayê ve hatî pesendkirin.

2. Divê sazîyên dewleta neteweyî hebin û li ser qaydeyên sîyasî û aborî ya neteweyîbûnê hatine pesendkirin.

3. Divê bi taybetî berhemên wekî roman hebin û têrî avakirina kullîyata neteweyî bikin.

4. Divê berhemên kullîyata neteweyî, bi awayekî rasterast û bi taybetî li zimanên Fransî û Îngilîzî hatibin wergerandin û ji alî rexnegir û derdorên wan ziman û wêjeyan ve hatibin pesendkirin û pîrozwerkirin.

Ger em têgiha Şûnewara Wêjeya Dinyayê, wekî welatekî bifikirin, şûn û deverên herî berfireh, erd û zevîyên wê ên herî berdar, dibin para ên wan welat û neteweyên ku cara pêşî di komara wêjeyê de cî dane xwe. Ew welat, di heman demê de, ew welat û netewe-dewlet in ku wan cara pêşî di warê sîyasî, aborî û wêjeyî de netewebûna xwe ava kiriye û di heman demê de jî wan di pêkanînen dagirkirin û mêtîngerîyê de jî cîyê xwe girtiye. Vê yekê, serdestîyeke aborî û sîyasî û serwerîyeke wêjeyî û hunerî kiriye para wan. Loma jî, bajarên herî xweşik ên komara wêjeya dinyayê û destegulî û mêzgirîya herî mezin para wan e. Û di heman demê de jî, tevlêbûn û qebûla wêjeyên, -an jî berhemeke ji wêjeyên- ‘neteweyên biçûk’ jî maye ji kêf û xwestina feraset û bêhnfirehîya wan welat û wêjeyan re.

Kurd, li dinyayê ne xweyî netewe-dewletekê ne loma jî li dinyayê bi awayekî koma etnîk ya mezin tîna nasîn û qebûlkirin. Wekî dongîya asayî ya vê deravê jî, tu berhemên Kurdî ên di Şûnewara Wêjeya Kurdî de, yekser û rasterast di ser Kurdîbûna wê berhemê re nagihîje şûnewara Komara Wêjeya Dinyayê. Ji ber ku hemû beşên ax û welatê Kurdistan, ne bihevgehîyê ne û welatê Kurdistan ne wekî dewleteke yekparçe ye, ne xweyî dewletekê ye û ji ber ku “Tu heyîneke ‘neteweyî’ bi tena serê xwe heyî nabe, bi wateyeke din; tu tişt bi qasî dewleta neteweyî ne navneteweyî ye” (Casanova, 2010: 50) Kurd û pê re jî Şûnewara Wêjeya Kurdî, her tim di ser dewletên serdestên xwe yên mêtînger re tîna qebûlkirin. Digel wê jî, Şûnewara Wêjeya Kurdî jî, wekî nasyarîya komeke etnîk ya bêdewlet û bêstatu di Şûnewara Wêjeya Dinyayê de ‘xweserî’ya xwe ava nekiriye. Û ji ber ku dewlet rastîneke pêwendîyê ye û pê re jî navneteweyî ye, heta ku dewleteke yekpare ya bi navê Kurdistan ave nebe, wê di hiş û dil û dinyaya Kurdistan ya honakî û sazîrî de, şûna Şûnewara Wêjeya Kurdî, di Şûnewara Komara Wêjeya Dinyayê de, tenê bimîne wekî hêmayeke dilxweşkir û xwazyar û wekî îmajêke aşopî û xemilandî.

Di vê deravê de, ji bo ku Kurd di vê rewşa bîndestîyê de jî karibin xwe bigihînin Şûnewara Wêjeya Dinyayê, serê pêşîn pêwîst e Kurd li xwe daynin ku serdestên mêtînger, her wekî ku Parîs ji bo mêtîngehên xwe kiriye, wê tu carî nehêle û ew ê tu carî wê ferasetê nîşan nede ku Şûnewara Wêjeya Kurdî ya di nav sînorên dewleta wê de avabûyî, ‘wekî xwe’ xwe

bigihîne Şûnewara Wêjeya Dinyayê û berhemên wêjeyî yên Kurdî ji alî wê şûnewarê ve werin pesendkirin û pîrozwerkirin. Loma jî, wergerandina berhemên Kurdî ya bo zimanê Tirkî, tu çareserî û aqûbeteke rind nayîne bo Kurdî, berevajîya wê, di helûmercên mêtîngê û bindestîyê de, ew reng çalakî dibe ‘wergera berevajî’ û tu havil bo Kurdî nayîne û dibetîyeke mezin û zêde tê de heye ku ew berhema Kurdî, di qada navneteweyî de, wekî berhemeke ji zimanê Tirkî jî were nasîn.

Digel vê yekê jî, keys û rê û rêbazeke dîtir heye ku her çend hinekî çetin û aloz xuya bike jî, ne deraqil û dûraqil e. Ji bo vê yekê, pêwîst e Kurd, bi awayekî sazîyî bixebitin; divê di warê zimanên wekî Fransî û Îngilîzî (û pê re jî Elmanî, Îtalyanî û Spanyolî) de, têra xwe zana û gihîştî bin û karibin di asta kreolîzebûnê de hevpêwendîyeke taybet daynin bi van zimanan re. Û bi awayekî bi pergala û hayjixweheyî; bername û rêçikeke taybet daynin ber xwe û berhemên Kurdî, bi taybetî romanên ku ew pê bawer in ku digel taybetîyên xwe yên neteweyî, ‘xweserîyeke wêjeyî’ di xwe de ava kirine, wergerînin ser zimanên Ewropî û di weşanxaneyên liberçav û mezin yên li wan welatan de çap û belav bikin; û bi vî awayî ji bo şûnewariya (spatial, uzamsal) Wêjeya Kurdî, dibetîyeke gengaz saz bikin.

Ew rêbaz, bi taybetî jî li bakurê Kurdistanê, wê nehêle zimanê Tirkî, ku serdestîya mêtînger wê ji bo pêkanînen xwe wekî alav bi kar tîne, wekî kend û bend li pêşîya Kurdî asê bibe û ew ê Tirkî bi vê rê û rêbazê were *bypasskirin* û wê berhemên ji Şûnewara Wêjeya Kurdî, karibin xweşikî xwe bigihînin Şûnewara Wêjeya Dinyayê û (dibe ku) ji alî rexnegirên wan ve werin pesendkirin.

Çavkanî:

Akarsu, B. (1995), Wilhelm Von Humldt'ta Dil-Kültür Bağlantısı, (Birinci baskı), İstanbul Matbaası

Casanova Pascale, (2010), Dünya Edebiyatı Cumhuriyeti, (Wergera bo Tirkî; Saadet Özen – Filiz Deniztekin), Weşanên VARLIK, 1. Basım

Césair Aim (2003), Yê Radiguhêzîne: David Barsamian: Ötekine Bir Yer Vermenin Bir Yolu Olmalı-Edward Said İle Söyleşi, Cogito, İstanbul: Yapı Kredi Yayınları, (Çev. Emre Barcadurmuş), Güz, sayı, 37

Damrosch David (2010), Dünya Edebiyatı Nasıl Okunmalı, İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, (Çev. Devrim Çetinkasap) 1. Baskı

Fumaroli Marc (2004), Edebiyat Cumhuriyeti, Dost Kitabevi Yayınları, Ankara, 1. Basım

Jameson Fredric (2008), Modernizmin İdeolojisi, İstanbul: Metis Yayınları, (Çev: Kemal Atakay-Tuncay Birkan), İlk Basım

Moretti Franco (2022), Dünya Edebiyatı Üzerine Düşünceler, <https://docplayer.biz.tr/21996314-Dunya-edebiyati-uzerine-duşunceler-franco-moretti.html> (alınma tarihi: 14-08-2022-saat:13:42)

Özkırımlı, Umut (1999) *Milliyetçilik Kuramları: Eleştirel Bir Bakış*, İstanbul Sarmal Yayınları, birinci basım

Rewşen-Name, (2004), Kovar, İstanbul: Adar, 2003

Xanî Ehmedê (2008), Mem û Zîn, Diyarbakır: Lîs Basın Yayın, çapa yekem

Zeraq Dilawer (2018), Bêjara Neteweparêz Di Kovara Hawarê De, Diyarbakır: Lis Basın Yayın, çapa yekemin

Zeraq Dilawer (2022), Rengê Hebûnê, Diyarbakır: Lis Basın Yayın, çapa yekemin